# Welatê Me


ROJNAMEYA HEFTEYÎ | SAL:1 HEJMAR:2 | 27 SERMAWEZ 1994 | BUHA: 25.000 TL(KDVD)


# KÎ AŞTIYÊ NAXWAZE?

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê, ji Abdullah Öcalan û Süleyman Demirel re mesaja aştiyê û sekinandina şer şand.

- Di konferansa YRWK'ê ya ku li navbera 19 û 20'ê Sermawezê de li bajarê Almanya Kolnê çêbû, qerara şandina mesajan hate standin. Ev mesaj ji Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan û Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel re hatin şandin.
- Di mesaja ku ji Süleyman Demirel re hate şandin de YRWK'ê, bala serokkomar kişand ser şerê li Kurdistanê û jê daxwaz kir ku ew bi nûnerên gelê Kurd re li ser maseya aştiyê rûne û pirsa Kurdî, bi riya siyasî çareser bibe.

Rûpel 2–3





## Atîna piştgirî da Kanî Yılmaz

Neh serokên şehrevaniyên (navçeyên) Atîna paytexta Yewnanîstanê, ji bo piştgiriyê ji bo berdevkê ERNK Kani Yılmaz, ji sefareta Brîtanyayê name şandin. Di 25'ê Sermawezê de neh serokên şehrevaniyên Atîna (Aya Paraskevî, Amarusîu, Îlîopulî, Melîsîa, Nea Îraklîo, nea Îonîa, Pallînî, Xaladrîu û Xolargos) bi nameyek rexneyî sefareta Brîtanyayê zîyaret kirin. Serokên şehrevaniyan, di nameyê de ji hikûmeta Îngîlîstanê daxwaza berdana Kanî Yılmaz dikin û sebebê vê nameyê bi vî awayî tînin ziman: "Gelê me yê Yewnan ji bo serxwebûn û demokrasiyê pir têkoşîn daye. Ev yek ji bo me bû sebeb ku em bi têkoşîna azadî û serxwebûna gelê Kurdistanê re bin. Binçavkirina birêz Kani Yılmaz ya ji aliyê hikûmeta Îngîlîstanê ve hatiye çêkirin, berdewama siyaseta Tirkiyeyê ye û bêdengmana Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ewrûpayê ye."

**Bekîr Bahoz / Atîna**



## Futbola xayin û golên bêşens

Carina tûrîstekî Alman, carina Madam Mîtterrand, carina mebûsekî Yunan, carina jî futbol dibe xayin.

Rûpel 4



### Hilbe Agirî

Serhildana Çiyayê Agirî rûpeleke bi rûmet e, di dîroka Kurd û Kurdistanê de. Di têkoşîna rizgariya neteweya Kurd de, ew xwedî cihekî giring e.

Rûpel 16

### Birîn êdî ne reş e!

Welatê me êdî hatiye dema bênderê. Wê li ba be, ji hevdû were hilbijartin, genimê hezar salan were şûştin û bê xwarin.

Rûpel 10



### Welatê Me rûmeta me ye

Welatê Me, di şeva danasîna hejmara xwe ya yekemîn de ji xwendevanên xwe yên Stenbolê li Restauranta Karîdesê soza xwendinê stand.

Rûpel 8–9

### Çand û huner rûhê însên e

Ji derî şer û şoreşê, ne mumkun e ku mirov, di warê çand û hunerê de, berhem û tiştên baş derîne holê.

Rûpel 7



### Peymanên mafên zarokan

Peymanên mafên zarokan ji aliyê hemû dewletên demokratîk û modern ve hatine qebûlkirin û îmzekirin.

Rûpel 14

JI ROJEVÊ


## PKK, DEWLET Û AŞTÎ

**Peyva "aştî" û "şerrawestin"ê van rojan li ser zaran nakeve. Sebeb jî, tê gotin ku wê PKK li Tirkiyeyê teklîfa şerrawestinê bike, hem jî di roja şazdehsaliya xwe de. Ji aliyê din ve, jîrek û aqilmend (!) wekî berê agahiyan didine şerxwaz û tundeyên Tirk ku hay ji xwe hebin. Li gorî wan PKK, bi dek ev teklîf li dewletê dike. Mebesta wê ew e ku xwe ji tengasiya ku tê de ye bifilitîne. Loma dixwaze şer bide sekinandin. Ev nirxandin li aliyekî, pisporên siyasetê jî dadixuyînin ku Tirkiye piştî qerarên Konferansa Brûkselê di warê dîplomasiyê de li hemberî PKK'ê têk çûye. Heta Kurd bi civîn û konferansên xwe yên navneteweyî ev rewşa xwe hîn bêhtir zexim kirine. Tê gotin ku, Tirkiye di qadên dîplomatîk de li pêşberî biryarên PKK'ê yên ji bo qonaxa danûstendinên siyasî û gavavêtinên aştiyane, di tengasiyê de ye. Her wiha, nêrînên der heqên PKK'ê de yên dewletên Ewrûpî jî tevî Amerîkayê ve, bi awayekî erênî (pozîtîv) diguherin. Li Tirkiyeyê jî mîna aliyê şerxwaz tê mêzandin.**

YEKÎTIYA REWŞENBÎRÊN WELATPARÊZÊN KURDISTANÊ, JI ABDULLAH ÖCALAN Û SÜLEYMAN DEMİREL RE MESAJA AŞTIYÊ Û SEKINANDINA ŞER ŞAND.

# KÎ AŞTIYÊ NAXWAZE?

**Di mesaja ku ji Abdullah Öcalan re hatibû şandin de ev dihat gotin: "Rewşenbîrên Kurd, bi salan tirsiyan, nehatin ba hev û bi hev re kar nedikirin. Bi têkoşîna PKK'ê rewşenbîrên Kurd jî êdî li nasnameya xwe xwedî derketin..."**



Kani Yılmaz gelek caran di civîn û konferansan de PKK'ê ya aştîxwaz dianî zimên. Bes ji aliyê dewleta Îngilîz ve hate girtin.

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK), ji bo aştiyê û şersekinandinê, ji Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan û Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel re mesaj şandin.

Di konferansa YRWK'ê de, ku roja 19 û 20'ê Sermawezê li bajarê Almanya Kolnê çêbû, qerara şandina mesajan hate standin. Di mesaja ku ji Abdullah Öcalan re hatibû şandin de ev tişt dihat gotin: "Rewşenbîrên Kurd, bi salan tirsiyan, nehatin ba hev û bi hev re kar nedikirin. Bi têkoşîna PKK'ê rewşenbîrên Kurd jî êdî li nasnameya xwe xwedî derketin..."

Rayedarên konferansê, ji bo aştiyê û şersekinandinê, bangî Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel jî kirin. Rewşenbîran di mesaja xwe de ji Demirel xwestin ku ew bi nûnerên gelê Kurd rûne li ser maseya aştiyê rûne û pirsa Kurdî bi riya siyasî çareser bike. Di mesaja ku ji Demirel re hatibû şandin de ev dihat gotin: "Şerê mêthingerî yê ku hûn li Kurdistanê dimeşînin tu faydeyê nade gelê Tirk û Kurd. Ji bo sekinandina vî şerî divê hûn bi nûnerên gelê Kurd re werin ser maseya aştiyê. Pirsa Kurdistanê bi riya siyasî çareser bikin."

Rewşenbîrên Kurd, du mehan berê bi Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan re hevdîtinek çêkiribûn. Li gorî gotindaran di vê hevdîtinê de rewşenbîran, fikrên Öcalan yên li ser aştiyê û bi giştî rewşa Kurdistanê hîn bûne.

### Îhtimala "şersikinandinê"

Ji bangên saziyên Kurdan û di van demên dawîn de ji çapemeniya Tirkiyeyê tê xuyakirin ku îhtimala şersekinandinekê heye. Wek tê zanîn 27'ê Sermawezê, salvegera 16. ya avakirina PKK'ê ye. Li gorî agahiyên ku li meydanê digerin, ji bo vê salvegerê, dibe ku serokatiya PKK'ê, şersekinandinekê îlan bike.

Di 23'ê Sermawezê de nûneriya ERNK'ê ya Rusyayê, ji bo çapemeniyê civînek çêkir. Di vê civînê de hate diyarkirin ku serokatiya PKK'ê û serokê wê, gelek caran bi awayekî pêşniyarî ev fikrên xwe gotine ku ew ji bo çareserkirina pirsa Kurdî hazir in. Di civînê de hate gotin ku aliyê aştiyê û şersekinandinê naxwaze, Tirkiye ye.

### Girtina Kanî Yılmaz û niyeta Tirkiyeyê

Berdevkê (sözcü) ERNK'ê yê Ewrûpayê Kanî Yılmaz, ji bo gereke dîplomatîk, çû Londrayê û li wir ji aliyê emniyeta Îngilîzî ve hate girtin. Kanî Yılmaz, piştî vê girtinê gotibû ku ew ji bo belavkirina qerarên Konferansa Brukselê çûbûm Îngilîstanê.

Derdorên çapemeniyê, ev tewra hikûmeta Îngilîstanê, wek qerareke nû nirxandin. Jî hêla din derdorên ERNK'ê didin diyarkirin ku di navbera Îngilîstanê, Almanyayê û Tirkiyeyê de peymanek heye. Li gorî vê diyarkirinê, ev dewlet dixwazin rê li ber xebatên tevgera Kurd ya dîplomatîkî û gavên ku PKK dixwaze ji bo aştiyê biavêje, bigrin.

Wek tê zanîn, serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, ji bo konferansa Brukselê pakêteke pêşniyariyên aştiyê pêşkêşî Tirkiyeyê kiribû.

Li gorî çapemeniyê, di demên nêzîk de tevgera Kurd, ji bo kongreyeke neteweyî û hikûmeteke li surguniyê dest bi xebatê kirine. Ji çapemeniya Kurd xuya dibe ku li ser avakirin û rola vê tevgera nû, derdorên Kurd jî di nav munaqeşeyekê de ne. Bi piranî li ser Rêxistina Rizgariya Filistîn (RRF) û Kongreya Neteweyî ya Afrika (ANC) tê rawestîn.

**Berlîn/Stenbol**
**Welatê Me**

## Bicihanîna aştiyê ne rehet e

**Li ser meseleya aştiyê û Konferansa Moskovê me dîtina Ezîz Akreyî pirsî û ev bersiv jê stand.**

Xwestina aştiyê tiştekî hêsan e. Lê bicihanîna wê ewqas ne rehet e. Rêzên ronakbîrên Kurdan, her çiqas kêmasiyên wan hene jî, xebateke xurt ji bo aştiyê dikin. Di vî warî de lidarxistina Konferansa YRWK'ê gaveke bimane ye.

Ji bo jiyankirina azadiyê, Konferansa Brukselê gaveke giranbuha bû. Di her bingehê gavên azadî de keda şerê gerîla heye. Konferansa Moskovayê ya Enstîtuya Rojhilat jî di vî warî de gaveke hêja ye. Ji ber vê yekê YRWK ji bo Konferansa Moskovê xebateke xurt pêk anî. Aştî, xapandin û lîstik nîn e. Gere aştî dawiya sekinandina şerê taybet a artêşa Tirk bîne û bibe semedî biratiya gelên Rojhilata Navîn.

www.arsivakurd.org

JÎJÎ






## Kutayî mangirtin

Katjimêrî 10, ser le beyanî rojî 16.11.1994 welatparêzanî mangirtû le Atîna -ke jimareyan 37 kes bû- berew balwêzxaney Brîtanya kewtine rê, rêpêwaneke alakanî PKK, ARGK, ERNK û bi wêney Serokî PKK le amêz girtibû. Rêpêwaneke giyanî bergirî û narezayî pêwe diyar bû, sebaret be girtinî Kani Yılmaz, beşdaran î em rêpêwane diway ewey geyiştin e balwêzxaney Brîtanya û yadaştnameyekî narezayan pêşkeş kirdin, rêpêwaneke kutayî pê hat. Paşan berew meydanî baxçey çand geranewe û le wê be amadebûnî 6 endamî perlamanî Yunanîstan, kesayetiyekî şarewanî Atîna, niwênerî parêzeranî Atîna û berpirsiyarî Balqanî ERNK Kombûneweyekî rojnamenûsî saz kira. Şayanî bas e, lem çalakiyan e hemûyan da televizyon û rojnamekanî Yunanîstan amadeyî berçawyan hebû. Be kutayîhatinî em komerojnamenûsiye, kutayî be mangirtinekeş hênre, ke 10 roj xayand.

**Atîna/Welatê Me**

**Serokê DEP'ê Hatip Dicle, li mehkemeyê îdia kir:**

# ÇILLER QASID ŞAND CEM ME

**Hatip Dicle, di parêznameya xwe de li ser têkiliya ku Tansu Çiller xwestibû bi wan re dîne ev got: "Dewlet, hem dibêje hûn endamên PKK'ê ne û me ji meclîsê davêje û hem jî ji bo em têkevin hilbijartinan, qasidan dişînin cem me. Ev tiştekî pir komîk e."**

Serokê DEP'ê Hatip Dicle, di danişîna DEP'ê de îdia kir ku hem serokwezîr Tansu Çiller û hem jî SHP'ê, qasîd (kurye) ji wan re şandine û xwestine ku em têkevin hilbijartinê.

Di danişîna mehkemeya DEP'ê ya 2'ê Sermawezê de Hatip Dicle, di parêznameya xwe de li ser têkiliya ku Tansu Çiller xwestiye dîne sekinî û ev got: "Dewlet, hem dibêje hûn endamên PKK'ê ne û me ji meclîsê davêje û hem jî ji bo em têkevin hilbijartinan, qasidan dişînin cem me. Ev tiştekî pir komîk e." Dicle, di dawiya parêznameya xwe de diyar kir ku, cezayê mehkeme ji bo wan bide, wî cezayî wek bedelê azadiyê dibînin.

Di danişîna mehkemeya DEP'ê de mebûsan Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) protesto kirin. Mebûsên DEP'ê bi hakimê mehkemeyê re li ser delîlan munaqeşe kirin. Li gorî mebûsan lazim bû lêgerhinek fireh ji bo îdîayên polîs û îtirafkaran û delhilên wan bihata kirin. Lê ev daxwaza DEP'vanan, ji aliyê heyeta mehkemeyê ve nehat qebûlkirin. Li ser vê tewra heyetê, mebûs ji salona mehkemeyê derketin.

Di vê danişîna mehkemeyê de di gel mirovên nivîskarê Tirk ê navdar Orhan Pamuk jî hazir bû. Wek tê zanîn ji roja ewilî û heta vêga çavên gelek kes û rêxistinên biyanî, li ser vê dozê bû. Doz taloqî 7'ê meha Mernfanbarê bû.

**Navenda Nûçeyan**



**Serokê DEP'ê Hatip Dicle bi îdamê tê mehkemekirin.**

## ...KURTENÛÇE...

### HADEP: Îptalkirina hilbijartinê, firseteke mezin e

Serokê Partiya Demokrasiya Gel Murat Bozlak, li ser îptalkirina hilbijartinê daxuyand ku bila mebûsên DEP'ê ji hefsê bên berdan. Serokê HADEP'ê Murat Bozlak, ji bo vê yekê ji serokên partiyên ku di meclîsê de cih digirin re name şand. Bozlak, di nameya xwe de bi kurtahî wiha dibêje: "Me ji serê meseleyê got ku ev hilbijartin, ne çare ye. Bila benda 84. bê guherandin û mebûstiya DEP'vanan li wan bê vegerandin. Demokrasî û aştî dikare bi vî awayî bê cih."

Nameya Bozlak ji Serokê Meclîsê Hüsamettin Cindoruk, Serokwezîr Tansu Çiller, Serokê SHP'ê Murat Karayalçın, Serokê partiya muxalefetê Mesut Yılmaz, Serokê RP'ê Necmettin Erbakan û Serokê CHP'ê Deniz Baykal re hatiye şandin.

### KDP û YNK li hev hatin

Şerê ji salekê û bi vir de di navbera herdu partiyên Başûrê Kurdistanê, KDP û YNK'ê de dewam dikir, bi peymanekê hate sekinandin.

Di îmzekirina Peymana Lihevhatinê de ji YNK'ê û KDP'ê 10 kes û ji Hereketa Îslamî, Asûriyan, Tirkmenan û Kominîstan jî yek kes, wek heyeta nûnerî hazir bûn.

Protokola peymanê, wê di demeke nêzîk de ji çapemeniyê û raya giştî re bê diyarkirin. Li gorî tê gotin sebebê vê peymanê, ji ber nûkirina hilbijartina ku wê di Gulana1995'an de çêbibe ye. Ji hêla din hate diyarkirin ku reaksiyona gelê Kurd û xebatên PKK'ê yên ji bo şersekinandinê, di nav herdu partiyan de, tesîreke mezin li ser çêkirina vê peymanê kiriye.

### Heyeta Enstîtuya Kurdî çû Moskovayê

Li ser daweta Înstîtûya Rojhilat ya Zanistê, ji Înstîtûya Kurdî ya ji bo Lêkolîn û Zanistiyê ya Li Berlînê, heyetek çû Moskovayê.

Herdu înstîtû, wê di 24-26'ê Sermawezê de li Moskovayê konferansekê li ser ziman, dîrok û wêjeya Kurdî çêbikin.

Ji bo vê konferansê ji Sovyeta berê gelek alimên navdar wek; Prof. Dr. Manuel Hasretyan, Dr. Şeref Aşîryan, Dr. Ordîxanê Celîl, Dr. Zerê, Dr. Bagîrov, Prof. Dr. Tabolow wê beşdarî civînê bibin.

Li aliyê din ji Înstîtûya Kurdî a Berlînê Prof. Dr. Î. Şerîf Wanlî, nivîskar Dilbixwîn û Doç. Dr. Cebar Qadir jî wê di civînê de cih bigirin. Di civînê de nûneriya ERNK ya Dewletên Yekbûyî ya Rusyayê jî wê beşdar be.

DIK

**Tirko bextiyaro**

Di rojnameya bi tirkî, Milliyetê de munaqeşeyeke balkêş hate weşandin. Ew di navbera Midûrê Emniyeta Stenbolê Nejdet Menzir û nivîskarê Tirk Aziz Nesin de çêbû. Çend cumleyên N. Menzir dehnkêş (balkêş) bûn. "Emê mirovan ji hev veneqetînin. Çi bextiyar e, yê ku ji xwe re dibêje ez Tirk im. Ez dîsa tekrar dikim: Çi bextiyar e, yê ji xwe re dibêje ez Tirk im. Mirov dikare xwe Kurd, Ereb, Laz, Boşnak an jî koçber hîs bike; lê yek tiştek tenê heye, çi bextiyar e, yê ji xwe re dibêje ez Tirk im."



Ji rojnameya bi tirkî Cumhuriyetê

## 'Dewletê Uğur Mumcu da kuştin'

Roja 24'ê Sermawezê ev cumleya li jor manşeta rojnameya Cumhuriyetê bû. Wisa xuya ye Ilhan Selçuk êdî nekarî bi jina Uğur Mumcu bide bawerkirin ku ew ji aliyê hêz an jî kesên din ve hatiye kuştin.

Ji vê nûçeya balkêş em beşekê pêşkêşî we bikin. "Li gor îdîaya jina Uğur Mumcu, Güldal Mumcu, Dozgerê DGM'ê îtiraf kiriye ku dewletê Uğur Mumcu kuştiye. Dozger Ülkü Coşkun gotiye dewletê ev bûyer kiriye. Ku îktîdara siyasî bixwaze ev iş dikare çareser bibe.

# Futbola xayin û golên bêşens

Peyva xayin û xiyanetê di devê çapemeniya Tirk de bûye wek benîşt. Çi li xweşiya wan û hesabê wan neyê dibe xayin. Berê tenê ji Kurdan re digotin xayin. Lê wisa xuya ye Kurdan ev îxanet wek nexweşîneke têger li der û dora xwe gerandin. Carina tûristekî Alman, carina Madam Mitterand, carina mebûsekî Yewnan, carina jî kesekî ji Komeleya Mafên Mirovan. Lê ev çarçove her tim fireh dibe. Dawî futbol jî bû xayin. Heftiya borî futbolê îxanetî li Tirkiyeyê kir, ji ber vê yekê jî Trabzonspor li hemberî Lazio têkçû. Di vê têkçûnê de qaleciyê Trabzonsporê mîna kesekî xayin hate sûcdarkirin. Rojnameya Hürriyetê vê têkçûnê di manşeta xwe de wek "Îxaneta futbolê" bi nav dike. Di pey re jî dibêje tevî futbola Trabzonsporê ya mukemel, bi xetaya Vîctor ya ku nayê efûkirin, Lazio li me bir û bi ser ket.

Hûn zanin xetaya nayê efûkirin îxanet e. Rasterast ji Vîctorê (Romen) re nabêjin xayin, lê wî bi awayekî din bi îxanetê sûcdar dikin.

Di vê xeberê de cumleyeke din jî heye, pir balkêş e: "Bi golên bêşens Trabzonê serî tewand. Em hîn dibin ku golên bêşens jî hene. Helbet ku futbol îxanetê bike, wê gol jî bêşens bin.




**Bi îhtîmaleke mezin, ku Vîctor careke din "xeteyên" xwe bidomîne wê bi xayintiyê were binavkirin.**

Her du heftiyan carekê xaçepirsa me wê bi xelat be. Di pêvajoya 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê binirxînin. Heta dawiya vê heftiyê emê li benda peyva veşarî ya xaçepirsa heftiya dîn bin.

**Jêrenot:**
Xelat wê bi qurayê li deh kesan bên

**Xelata Xaçepirsê**




**Zagroslar**
**Rahmi Batur**


## AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

| | Li Hundir | Li Derve |
|---|---|---|
| ☐ 3 Meh | ☐ 400.000 TL | ☐ 30 DM |
| ☐ 6 Meh | ☐ 800.000 TL | ☐ 60 DM |
| ☐ 12 Meh | ☐ 1.600.000 TL | ☐ 120 DM |

Bedelê Abonetiyê ez radizînim


**Li Tirkiyê** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

**Li Derve** – Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV : ..........................
NAVNÎŞAN : ..........................
..........................

**Navnîşana Welatê Me**
Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
**Tel-Fax:** 2491344 – 245 29 91


## XAÇEPIRS




**PEYVA VEŞARÎ** 1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

www.arsivakurdi.org

DIK

### Salrojî karesatekey zankoy Polî Tekniyo

20 sal le mewber û le rojî 17.11.1973 da rijêmî dîktatorî ewsay Yunanîstan ke mindalî kudetay serbazî bû, le naw zankoy "Polî Tekniyo"y Atînay paytext da dijî raperînî xwêndkaranî ew zankoy ye, be hoy tankekanye we 40 xwêndkarî kuşt, hemû salê gelî Yunan yadî em roj e be rêz û şiko we dekenewe, pêşanga û rêpêwanî mezinî bo saz deken. Le yadî 20 saley ew rûdawe da sercem partekanî Yunanîstan pêşangayekyan saz dabû. Lew pêşangaye da cêgey PKK''îş şiyaw û ber çaw bû. Ser le êwarey heman roj îş hevalan û dostanî PKK beşdarî ew rêpêwane dûr û dirêje yan kird ke le nawendî bajêrî Atîna we berew balwêzxaney Amerîka be rê we deçû. Şayanî bas e, le rêpêwaneş da şiwênî PKK dîsan şiyaw û berçaw bû, gelî Yunanî îş beşdarî dirûşmekanî PKK yan dekird ke be zimanî ewan dewitranewe. Lem pêşanga û rêpêwane da hezaran bilawkirawe û berhemî PKK geyiştin e destî gelî Yunanîstan.

**Atîna/ Welatê Me**



### Li Yewnanîstanê meşa Xwendekarên Polîteknîkê

Li paytexta Yewnanîstanê Atîna, hinek xwendekarên Polîteknîkîyê xwestin kudi salvegera Serhildana 1973'yan de ber bi balyozxaneya Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê (DYA) bimeşin. Lê polîsan nehişt ku xwendekar vê bûyera dîrokî bi bîr bînin. Di navbera girseyê xwendekaran û polîsan de şer derket û gelek kes birîndar bûn. Li wir xwendekarên ku ketin destê polîsan, di gel lêdaneke tund, hatin girtin.
17'ê Sermaweza 1973'yan li Zanistgeha (Unîversîte) Polîteknîkî xwendekaran li dijî cunta s erî hildabûn. leşkerî serî hilda bû..

### "Buhayê aştiya Suriyê zehf e"

**Îzak Rabîn li paytexta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Washingtonê, roja 23'ê Sermawezê li ser aştiya bi Suriyeyê re agahî da rojnamevanan. Serokwezîrê Îsraîl got: "Ez dizanim Hafiz Esad aştiyê dixwaze, lê buhayê wê aştiyê ji bo me pir giran e û ev aştiya Suriye naşibe ya me." Îzak Rabîn di dûmahîka agahîdayîna xwe de derbirî ku wê xebatên aştiyê bi Suriyeyê re dom bikin. Suriye ji Îsraîlê vekişîna ji Girê Golanê dixwaze. Îsraîl jî, xwe nade ber vê yekê.**

### Li Nepalê serkeftina komunîstan

Di hilbijartina Nepalê ya ku 20'ê Sermawezê (Mijdar) de, Komunîstên Yekbûyî yên Maksîst Lenînîst (UML) bi ser ketin. Li vî welatê Himalayayê, komunîstan 87 mebûstî bi dest xistin. Partiya li ser kar, Partiya Kongreyê 80 endamdtî kar kirin. Li vî welatê ku bi destê qralekî tê îdarekirin, parlamento ji 250 endamtiyan pêk hatiye. Nayê hêvîkirin ku serkeftina komunîstan di polîtîkayên dewletê pir guherînan çê bike.



# PERGALA NÛ: SENARYO Û RASTÎ

Wek tê zanîn li ser rûye erdzemînê bi hilweşîna sîstema sosyalîst, ji aliyê hinek kesan ve dawiya dîrokê hat îlan kirin. Polîtîkazanê Amerîkayê Fukuyama digot: " Êdî derket holê ku kapîtalîzma liberal ji bo mirovahiyê sistemeke timzindî ye" Berî şerê kendavê ji ev dema nû ji aliyê serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve wek Pergala Nû ya Dinê hat binavkirin. Dîsa, demokrasî, aştî ango lihevkirin, bazara serbest wek taybetiyên vê dema nû hatin bilêvkirin.

Li gorî senaryoyê diviyabû hemû nakokiyên civakî û neteweyî bi riya lihevkirinê bihatana çareserkirin, jixwe êdî tu astengî li ber demokrasiyê nemabûn, lew re sîstema totalîter hilweşiyabû, wê di gel bazara serbest demokrasî jî bihata welatên sosyalîst yên berê. Li gorî senaryoya hinek sosyal demokratan wê li welatên sosyalîst yên berê, senteza sosyalîzm û kapîtalîzmê ango sîstemeke sosyal demokrat çêbûya.

Patronê Cihanê û rêveberê vê Pergala Nû DYA'yê Digot: "Va ye ji niha ve li rojhilata navîn di navbera Îsraîl û Ereban de lihevrûniştina aştiyê dest pê kiriye" Piştî du salan jî di navbera Îsraîl û Rêxistina Rizgariya Filistînê (RRF) de bi heyteholekê li Washington, li Birca Spî peymana aştiyê hate morkirin. Di vê navberê de li Afrîkaya Başûr dawî li rejîma nijadperest dihat, Serokê ANC'ê dibû serokkomar. Li Îrlandayê îsal bi şerrawestandina IRA'yê ya ku 15'ê Rezberê hate daxuyandin, hate gotin ku êdî îmkan tune ji riya aştiyê bê vegerîn. Li Angolayê peymana duyemîn hate mor kirin.Li Srî Lankayê, lihevrûniştinan dest pê kir, li Cezayîrê qala diyalogê tê kirin û hwd.

Li hinek welatên wek Elsalvador, Nikaragua, Angolayê berî hilweşîna Yekitiya Sovyetê peymana aştiyê hatibû mor kirin. Lê ev jî wek berhemên Pergala Nû dihat binavkirin.

Senaryo bi kurtasî ev bû, lê divê naveroka wê ya rastîn bê deşîrre kirin. Îdiaya wan çi bû, dimena birastî çawa ye?

**SAMÎ BERBANG**

# FAL

**BERAN** (21 Adar - 20 Avrêl)

Cesareta xwe bi zanebûn bi kar bînin û hinekî nefsbiçûk bin. Mirovê ku nikaribe qoçelên du bizinan ji ser hev rake, divê dev ji fort û mêraniyan vala berde.

**GA** (21 Avrêl - 21 Gulan)

Di van rojan de li dinyayê guherîn çêdibin. Bala xwe hinekî bidin dora xwe. Heke wiha dewam bike, dibe ku hûn ji bêhereketiyê biqerimin û cardin îmkana rabûnê nebînin. Xwe bilivînin.

**CÊWÎ** (22 Gulan - 21 Pûşper)

Baweriya we bi we heye. Carinan hûn çavnebariyan dikin. Lê jiyana we her ku biçe wê bê guherandin; ji ber ku hûn bi çargavî ber bi guherînan diçin.

**KEVJAL** (22 Pûşper - 23 Tîrmeh)

Dilên we bi mirovên belengaz dişewite. Di emel de tu hereket ji bo alîkariya wan ji we çênabe. Ji bîr nekin, tenê dilşewatî fêdê li kesî nake.

**ŞÊR** (24 Tîrmeh - 23 Gelawêj)

Der û dora we ji hal û hereketên we ditirsin. Kes ji ber vî xwiyê we, newêre fikrên xwe bibêje. Heybeta xwe bi nazikbûnê rê hevalên xwe bidin. Me got nazîk, xwe nekin wek pisîkan !

**SIMBIL** (24 Gelawêj - 23 Rezber)

Bêqisûrî bûye navnîşana we. Jiyana we bi hesab û kîtêb e, lê hûn jî ferq dikin ku mirov lazim e carinan rişmê ji dest ber de. Monotonî stresê çêdike.

**MÊZÎN** (24 Rezber - 23 Kewçêr)

Hûn carinan nikarin derheqê tiştan de zû qerarê bidin. Ev jî di têkiliyên we de bêpîvanekê çêdike. Ji standina qeraran netirsin. Qerareke nebaş, ji bêqerariyê çêtir e.

**DÛPIŞK** (24 Kewçêr - 22 Sermawez)

Her gav bêoxiriyek bi we re digere. Gava hûn bixwazin, dikarin vê bêoxiriyê li ser xwe rakin. Lê dibe di nêzîk de xeberek baş ji we re bê, ecêbmayî nemînin.

**KEVAN** (23 Sermawez - 21 Berfanbar)

Rewşa we dibe ji bo demekê ber bi xerabiyê ve biçe. Dilê xwe bi halê xwe neşewitînin. Wê ev roj jî derbas bibin. Ji bo wextekê derkevin gerê, wê bêhna we fireh bibe.

**KARIK** (22 Berfanbar - 20 Rêbendan)

Hûn di karê xwe de bi piranî bi ser dikevin. Bi bêhna fireh û tecrûbeyên berê hûn bi rehetî meseleyên xwe çareser dikin. Lê di hin karan de îradeya we, carinan rê li ber serkeftina we digire.

**DEWLIK** (21 Rêbendan - 11 Reşemî)

Ji meraqan her tişt bala we dikşîne. Hûn carinan bêhemdê xwe be jî paşgotiniyan dikin. Ji bîr nekin, jiyana kesan a xisûsî, pîroz e. Dev ji van tiştan berdin, ma hûn paparazî ne?

**MASÎ** (20 Reşemî - 20 Adar)

Ji rû ve hûn fedyokî û nerm dixuyîn. Derdora we jî, ji vê rewşa we îstifade dikin û di her firsetê de neheqiyan li we dikin. Dev ji vê serjiniktiyê berdin.

# Ula Kurdo! Gel buraya



Li gundekî Kurdistanê, gundiyekî reben, rojekê radibe û ji jina xwe re dibêje: "ezê herim bajêr, xwe hînî zimanê Tirkan bikim." Kurdê me dikeve rê û berê xwe dide bajêr. Li nêviyê riya bajêr rastî eskerekî tê. Gava esker çav li Kurdê me dikeve, ji dûr ve baang li wî dike û dibêje:

"Ula Kurdo, gel buraya."

Kurdê me ber bi wî diçe. Bi esker re hespek, tajiyek û çivîkek hene. Esker ji Kurdê me re dibêje, li van heywanan miqayet be, heta ku ez herim destavê. Esker diçe destavê û tê ku çi bibîne! Ew heywanên ku dabûn destê Kurdê me, ne li wir in. Esker bi hêrs jê dipirse. Kurdê me wek ku baş jê fam kiribe cevaba wî li ser hev didê. Pirsên esker û cewabên Kurdê me ji bo ku bi kafiye ne, em wan li dû hev diweşînin.

Esker: " Ula hani kuş? "

Kurd: "Destê min kir qeramûş

Min serî jêkir avêt nav pûş!"

Esker: "Ula hani it?

Kurd: "Li dora min kir wîte wît,

Min dar lê xist, ling lê bûn çît"

Esker: " Ula hani at?"

Kurd: "Li dora min kir hate hat

Min dar lê xist, ber te de nehat?"

Ez texmîn dikim hûn jî dawiya vê diyalogê meraq dikin. Dawiya wê ji me re ne xerîb e. Kurdê me ji eskerê Tirkan lêdanek baş dixwe û berê xwe dide malê. Yanê hewesa wî ya hînbûna Tirkî jî li nêviyê rê ma.

**ŞÊXÊ EDOKÊ**

# Çima Kurd ne Kurd in?



Ez bawer dikim meraqa we niha ne çima ye. Meraqa we bêtir li ser fotografê nivîsê ye. Çawa meraqên we hene yên min jî hene. Kurdan berê, carinan (!) bi hev re munaqeşe dikirin. Hinekan ji wan digot: "Ger Kurdistan ne sosyalîst be, bila ava nebe çêtir e." Yanê ji karê ber xwe direviyan û li ser meseleyên pêş, wek Devlet Planlama Teşkîlata Tirkan dixebitîn. Gelek caran jî ji hev dixeyidîn. Meraqa herkesî cihê cihê ye, ev jî hertim (!) tiştekî normal e. Ev serê çendakî ye ez difikirim, di pêş de ji bo muzeyekê Kurdek lazim be, gelo wê ji Kurdistanê bê dîtin?

Em vegerin îroj. Me ji Elwis Presly heta Mihail Gorbaçov gelek kes kirin Kurd. Hîn jî ev asîmilasyon dewam dike. Ji xeynî vî karî, me li gelek deverên dinyayê Kurdên nû peyda kirin. Kurdên Nîjerî, Bangledeşî, Pakîstanî, Efxanîstanî, Malezyayî, ÇînîMaçînî, Kafkasî, Emerîkayî, Ewrûpayî (Hîngî pir in, dor nehat jimartina yên din) û hwd...

Lê tiştê ecêb ne ev e. Tiştê ecêb li Kurdistanê Kurd peyda nabin, yanê kes li Kurdbûna xwe xwedî dernakeve.

Hûn dizanin carekê yekî hatiye ji serokê Tirkan Kemalo pirsî ye û gotiye: " Ji bo Bexçeyê Heywanatan hirçek lazim e." Wî dirêj nekiriye û gotiye: "Herin li Konyayê we kî dît, bînin. " Ez meraq dikim, gelo wê şensa serokê Kurdistanê di pêş de çêbibe ku yek jê re bibêje, ji bo muzeya tarîxê ji Kurdan nimûneyek lazim e, ew jî kare dirêj neke û bibêje;, her felan bajarî hema kî ket ber we bînin?

Lê hûn meraqa nekin, ji ber ku ez ji dêvla we van tiştan meraq dikim. Ez li ser vê yekê fikirîm. Fotografê ku tê dîtin, ji niha ve min hazir kiriye. Hem ji bo serokê Kurdistanê û hem jî ji bo muzeyê. Li Kurdan pîroz be!

**SILÊMAN CUMO**



www.arsivakurdi.org

## RASTIYA ME

A. ÎNANÇ

### Çand û huner ruhê însên e

Ji hemû aliyan ve xebatên welatparêzî nû dibin û bi ser dikevin. Çand û huner ruhê însên e. Canê însên e. Bi rastî, heta îro di binê zora dijmin de tunebûna gel, tunebûna welêt di eynî wextî de tunebûna çand û hunera gel bû jî. Lê niha gel ber bi azadî û serxwebûnê ve dimeşe.

Baş tê dîtin ku ev şer jiyaneke nû çêdike. Di vir de her kes xwe dibîne. Ji derî şer û şoreşê, ne mimkûn e ku mirov di warê çand û hunerê de berhem û tiştên baş derîne holê. Şoreşê em gihandine cihekî ku pirsên wek, "Bi van însanan çi dibe, çi jê derdikeve?" bên pirsîn. Ev pirs ne bi tenê yên şoreşê ne, di bingeha xwe de yên rewşenbîr, nivîskar û hunermendên Kurd in jî. Ji berê de lazim bû bersiva van pirsan bihata dayîn. Çima însanên me ew qas ketî û perîşan in? Çima ji welatê xwe ew qas bi dûr ketine? Çima ji serxwebûn û azadiyê ew qas dûr in? Çima însanên me ji rastiyên xwe dûr ketine? Rewşenbîrên me çima wilo ne?

Bêyî hunermend û rewşenbîran, jiyan û şoreş ne mimkûn e. Li vir kê jiyan zû nas kir, kê xwe gihand rastiyê? Heger tu rastiya welatekî ji her aliyî ve nas nekî, jiyana gel neyinî zimên tu niviskarê çi yî? Çima heta niha rewşenbîrên mezin derneketin, ên ku derketin jî çima bêdeng man? Baş tê zanîn, welatekî ku bindest be ne mimkûn e rewşenbîrên wî jî binavûdeng bin. Ew çiqas mezin be, çiqas xurt be jî nikare xwe bi dinyayê bide îspatkirin. Niha demeke nû dest pê kiriye. Ji her aliyî ve dengê me dertê. Rastiya welêt derkete holê. Mejî û dilê gel zelal bûn. Gel xwe ava dike, çêdike û dimeşê. Taybetiyên rewşenbîran hene. Ew zimanê gelê xwe ne. Dil û cesareta gelê xwe ne. Di şexsiyata xwe de hemû aliyan temsîl dikin. Heta niha bêîmkan bûn, bêsiyaset bûn. Însanê bêsiyaset kor dimeşe. Dema ku herkes bêsiyaset be, hezar rê li pêşiya mirov derdikevin. Wê demê ne mimkûn ku mirov bikaribe bi hev re bimeşe. Heta niha ev wiha bû. Kor dimeşiyan, bi tenê dimeşiyan. Di dawiyê de jî di destê kesekî de tiştek nedima. Niha tê dîtin ku gel çawa li ser rastiya xwe rabûye. Ev ji rewşenbîran re îlhameke mezin e. Divê ruhekî mezin û cesareteke mezin bide rewşenbîran, hunermendan.


# Şerkarekî zanistê: Friedrich Engels

Bêguman 28'ê Sermaweza 1820'an 174 sal berê wek rojeke ji rêzê dihat dîtin. Lê piştî 20 salan derket meydanê ku ne wisa ye.Li Almanyayê, li bajarê Bremen endamekî biçûk kete nav malbateke çilag (Tekstîlvan). Friedrichê biçûk salên di pêş de wê wek mirovekî jîr û biaqil ji derdora Hegelgirên Ciwan bihata binavkirin. Engels, wek mirovekî rêzdar ê vê hareketa întelektuelî bû û ev hareket jî di dîroka felfeseya Almanî de xwediyê cihêkî taybet e. Engelsê ku piştî dibistana bilind (lîse) dev ji xwendinê berdabû, hîn Marks nasnekiribû, sîstema hizra materyalîst fêm kiribû.

Wî wek şervanekî zanîstê, ramanên xwe bi lêkolîna mijarên herî tûj û girîft kamil kirin. ji ber ku wî dizanibû proletarya nikare bi riya aştiyê îxtidarê bixe destê xwe, li ser hunera şer rawestiya. Di warê hînbûnê zimanên biyanî de jîriya Engels şayanî gotinê ye. Wî redaksiyona gelek klasîkên Marksîst yên bi zimanê biyanî bi destê xwe çêdikir. Ew matematîkzan, fîlozof, pisporê zanistên xwezayî û her wiha jî stratejîst û civaknasekî hêja bû.

Di gel ku ev avakarê Înternasyonala Yekemîn bû û di warê nivîsandina Manîfestoyê de xwediyê kedeke hêja bû, dîsa jî wî xwest ku di orkestreya avakirina sosyalîzma zanîstî de bibe "kemana duyemîn"

Divê mirov dostaniye wî û Marks, ya ku 40 salî dom kir, wek mînake tekûz a dostaniya Întelektuelî bi bîr bine. Wî piştî mirina Marks bi serkeftinî karê hazirkirina Kapîtalê bir serî. Mirovên sitembar wî wek mamostayekî ji doza xwe venager, sitemkar jî wek dijminekî zana bi bîr tînin.



# Ev çîroka me hemûyan e

Dema ku " Artêşa Qeşemê" di bin fermandariya "Generalê Xizantiyê" de êrîşî çarkenarê Rûsyayê dikir, ku li ser erdê Çarîtiyê mirin pêşbaziya herî mezin bû, bi hezaran mirov bivên nevên di demeke rojê de beşdarî wê pêşbaziyê dibûn. Îskorpût û jana zirav wek peywirdarên Çar ên taybet bûn. Ew her du bobelat qedera wan bû. Sebeba gotina"Mujikê bê–Îskorpûtê ne mujîk e" ango gundiyê bê nexweşiya îskorpût ne gundî ye ji vê rewşê dihat. Fabrîkeyên piştî ku di tariya serê sibehê de bi hezaran karker, bi zinditî dixwarin, di reşahiya şevê de ew li kuçeyên pîs û sar vedireşandin. Sermayedar li ser milên tezeyan radiket, lê karkeran ji ber jana zirav can didan.

Marksîstên Rûs piştî Komunê bi 33 salan, di serhildana karkeran a mezin a pêşîn de, bi qelsitiya partiya xwe hesiyan. Despotîzmê li "Zîndana Gelan" di nav 3–5 salan de bi hezaran karker û şagirt şandin sêdarê. Te digot qey Çar "Şefê Orkestraya Mirinê" bû. Sîbîrya bi hemû şîrîniya xwe(!) mirin pêşkêşî bi hezaran girtiyan dikir.

Karkerên Rûs di deregiya êvara 24.10.1917'an de (li gorî salnameya nû 6.11.1917) "Qesra Zivistanê" dan bin fermandariya Sovyetan û Çaritî tevî serwerên Rûs şandin nav rûpelên gemarî yên dîrokê.

Taviyên serhildanên ku bi 1917'an dest pê kirin bi me çi didin fêmkirin ? ji wê gavê heta niha ji daxwaziya qezencê ya sermayeyê tiştek kêm bûye ? Ma bazirganên çekan ên navneteweyî dilên wan êşiya ku dev ji firotinê berdin ? Ma dewletên kolonyalîst li koloniyên xwe bi dilê rihet vekişiyan û lêborîna (uzrê) xwe xwestin? Ma hîn sermayedar ji bo qezenca xwe dev ji firotana jehrê (narkotîk) û goştê mirovan ( jinan) berdane? Ma bertîlxwarin û hewldana qezenca bedilhewa di pratîkê de hatiye qedexe kirin ?

Mirov kare bibêje ku îro li ser rûyê erdê herkes li gorî xebata xwe perê distîne? Bidestxistina kanên dewlemend ên dinê ji serê monopolan derketiye gelo?

Dinya hîn jî vê nasnemaya gemarî li ser xwe digerîne. Di gel hewlên "entelektûelên çepel " ku dixwazin mêjiyan li hev bixin sosyalîzm hîn bêhtir wek îdeal dikeve xewnên karkeran û hemû mirovên çewsandî û bi namûs

Mirov nikare bibêje min çi jê ye. Lewre ev a ku tê vegotin çîroka me hemûyan e.

**EZNAS MAYA**

WELATÊ ME, DI ŞEVA DANASÎNA HEJMARA XWE YA YEKEMÎN DE JI XWENDEVANÊN

# WELATÊ ME RÛMETA ME YE

## 'EM NE BÊHÊVÎ NE, EM NE GUNEH IN'

**Şeva Danasîna Welatê Me, di 21'ê Sermawezê de li Restuaranta Karides'ê bi van gotinên Gerînendeyê Weşanê yê Welatê Me, Mazhar Günbat dest pê kir.**
**M. Günbat got:" divê em ne pesna xwe bidin, ne jî gunehê xwe, bi xwe bînin, Wa ye me tenê rojnameyeke heye, hîn hejmara xwendevanan bi hezaran tê pîvan, lê em qet ne bêhêvî ne, heke hûn dixwazin bibînin ka çiqas bilind e hêviya me li çiyan binêrin bes e." Piştî M. Günbat Ozan Xanemîr bi stranên gelêrî dilê beşdaran geş kir. Li dû Xanemîr Koma Çiya bi stranên xwe beşdar rakirin ser piya.**
**Pişt re navê xwediya Welatê Me Aynur Bozkurt hate xwendin, wê di axaftina xwe de bal kişand ser, bêsazîbûna gelê Kurd, ji rewşenbîr û kesên xwende xwest ku li saziyên Kurdan xwedî derkevin û got:"dewlet bi saziyan çêdibe". Serokê HADEP'a Stenbolê birêz Kemal Parlak, di şevê de axaftinek kurt kir. Axaftina dawî ji aliyê berpirsiyarekî têkiliyên bi gel re yê YNK'ê Bextiyar Rauf kir.**
**Piştî axaftinan şev, bi stranên Ganî Nar qediya.**
**Di şevê de tiştê cihêreng, hakîmiyeta zimanê Kurdî bû. Cara yekemîn di pîrozbahiyekê de Kurdî bûbû zimanê sereke. Di şevê de gelek mirovên nasdar dihatin dîtin wek: Zimanzanê Kurd Feqe Huseyin Sağniç, berpirsiyarê kovara Nûbiharê Sabah Kara, cîgirê gerînendeyê weşanê yê Özgür Ülke Ferda Çetin, nivîskar Nebahat Çetin, serokê HADEP'a Stenbolê Dr. Kemal Parlak, Îshak û Zübeyde Tepe, Zeki Bozalan, Ümit Fırat, Îbrahîm Genç, Faik Bulut, Ragip Duran û hwd. Mebûsê Kurd A.Melik Fırat ji Enqereyê hat şevê lê ji ber ku di rê de nexweş ketibû, nikaribû beşdarî şevê biba. Xebatkarên Özgür Ülkeyê, NÇM, Înstîtuya Kurdî, Yekîtiya Malbatên NÇM, Özgür Halk, Sosyalist Alternatif, weşanxaneya Dozê, weşanxaneya Komal, kovara Stêrka Rizgarî, T. Ziya Ekinci, hinek endamên Sağlık-Sen'ê, grubek ji Karkerên Welatparêz ên Belediyeyê û gelek kesên din bi mesajên xwe beşdarî şevê bûn.**



Aynur Bozkurt: "Di avakirina dezgehan de, barê mezin, ê rewşenbîr û welatparêzan e. Divê ku, em tu valahiyê bê sazî nehêlin û li gorî çaxê bimeşin, bixebitin û hewcetiyên gelê xwe, bînin cih."




Mazhar Günbat: "Divê em ne pesna xwe bidin, ne jî gunehê xwe bi xwe bînin. Em ne guneh in, divê em bixebitin."



Bavê Ferhat Tepe (muxabîr yê Özgür Gündemê) di şeva Welatê Me de, bi hebûn û axaftina xwe ya bi mane salon rakir ser piya. Îshak Tepe: "Sedemê bindestîmayîna me ev e ku em xwedî li zimanê xwe derneketine. Nezanîn ne şerm e, ji îro pêve hînnebûn şermeke mezin e. Divê rojname rewşa gel bigire ber çavan, zimanê xwe hêsan bike. Gelê me divê bibe xwedî sazî, bi vî awayî em dikarin azadî û serxwebûna xwe bi dest bixin. Çêbûna şeveke wiha gelek baş e."

## XWE YÊN STENBOLÊ LI RESTORANTA KARÎDESÊ SOZA XWENDINÊ STAND. HER KESÎ BI YEK DENGEKÎ BANG KIR:



Mêvan di şevêke xwerû bi Kurdî de bi stranên govendê rabûn ser piyan.



K. Parlak: "Gelê Kurd divê li dijî qedexekirina dewletê rabe û li zimanê xwe xwedî derkeve."




Mêvanên me yên Tirk jî hebûn, Ragıp Duran ji van bû: "Musa Anter îşev li vir e."



Spîkera şevê Şevîn Civaknas bi cilên neteweyî û zimanekî herikîn pêşkêşî kir.



Ji komên NÇM'ê Koma Çiya wek her car dîsa bi stran û klamên kurdî yên şoreşgerî û otantîk salon şad kirin. Mêvanan dilxweşiya xwe ya ji bo Koma Çiya bi çepikan diyar kirin.




Nivîskar Faik Bulut jî di nav mêvanên me de bû.



Beşdarbûna Berpirsiyarê Weşana Kovara Nûbiharê Sabah Kara, rengê neteweyîbûnê dida şevê.



Di muzeyedê de Zana Farqînî bal kişand ser xwe.



Ji Başûrê Kurdistanê Bextiyar Rauf: "Welatê Me li çarmedorê Kurdistanê bibe rojnameyeke neteweyî."




A. Ekber Oğuz: "Divê di Kirdkî (Dımilî) de devokê Dêrsimê wek bingeh bê bikaranîn. Rewşenbîrên ku bi Kirdkî dizanin divê binivîsin."



www.arsivakurdi.org

## JI ÇAV VEKIRINÊ HETA ÇAV GIRTINÊ JIYANA MIROVÊ KURD



# BIRÎN ÊDÎ NE REŞ E

Di pir hêlan de jiyana me Kurdan xav e. Tê zanîn, sedema girîng bindestî ye. Ev deh yazdeh salên paşîn rê li avê hat vekirin. Çiqas were vedan ewqas ava zelal dertê. Wekî gîsnê cot; çiqas bê şixulandin ewqas wê bibiriqe. Welatê me êdî hatiye dema bênderê. Wê li ba be, ji hevdû were hilbijartin, genimê bi hezar salan were şûştin û bê xwarin.

Dergûş dema keçik bûya bêrûmet bû, dema law bûya jê dihat hezkirin. Keçikan bi xelata xwe deng didan. Berê çek (tiving) dihat standin van salan televizyon tê girtin. Zewaca keçikan aliyekî ve xelasbûna wan bû. Şahiyên keçikan li herêma Serhedê; dîlan, bêrîvantî, hirîşûştin, destar, dankutan, bijartina bulxur û dilketina xortan bû. Dergûş bi kul û êşa mezin dibûn. Ê ku bi jiyana xedar û bi xezeb re serî nekişanda, dimir.

Jiyan ne tiştek xedar e bi rastî, lê ji bo Kurdan wilo bû. Pirî caran xortê dilovan ji bo yek qevşek giya dihatin kuştin. Paymal dibûn. Ê ku pir mirov dikuştin deng û nav didan! Çûro, Mistoyê Koloto, Fesîhê Mihê Mîrze, Bişarê Çeto hwd. Bi sedan mirov bi çol û çiya diketin. Ji bo çi bû? Navê vî belengazî û nezaniyê di toreyê de mêranî bû! Pirî wan fîraran di dawiyê de li jiyanê werqilîne, ponijandinê hişê wan aniye serê wan. Mînak: Mistoyê Koloto, tê agahdarkirin ku vî mirov piştî fîrariya xwe çend heb jî zordest kuştiye. Pirî dengbêjan jî, ji van pevçûnê lewitî, kertîre bi nezanî kilam distirandin. Hinek kilamên Husêno, Zahiro, Şakiro... wilo bûn. Di 1991'î de min ji Husêno, sedemên vî pirsî. Axîn kişand, xemgîn bû wilo bersiv da:
"Ji nezaniyê bû,
wê kurê min li ser şaxa nû bimeşe."

Mirovê gundî pir dixebitin lê qîmeta keda xwe nizanin. Mirov heye deh, bîst, sîh salî bi sedan mêşin xwedî kiriye, lê yek hebek bi xwestin şerjê nekiriye. Ji aliyekî ve jî, ji bo pêşerojê lewra pirî wan dibêjin,
ê me tişt nabe, bila zarokên me kêfxweş bin bes e. Kurd ewqas kesîretî, bindestî, bêparîtî, riziyayî dîtine, lê belê dîsa jî, wekî hinek neteweyan parsekî nekirine, çavên wan ne li geştê (ganîmet) bûye.

Apê mezin, birîn êdî ne reş e, bi kêra hemdemî hate qelişandin.

**JÊHAT GIMGIM**

---

**KURD-A**
Kurdisch-deutsche Presseagentur
Kürt-Alman Haber Ajansı

### Polîsê Alman girt ser KURD-A'yê

Polîsê Alman, di 22'ê Sermawezê de girt ser Ajansa Nûçeyî ya Kurd û Alman, Kurd-A'yê. Di sengirtina polîsan de, li gorî rapora ajansê, gelek malzemeyên wan hatin tahrîbkirin. Polîsê Alman, sebebê sergirtinê, têkiliya ajansê û ya PKK'ê û ERNK'ê nîşan de. Wek tê zanîn sala çûyîn, di eynî mehê de dîsan polîsê Alman girtibû ser ajanseke Kurd, Kurd-Ha'yê. Di wê bûyerê de dîsa têkiliya bi PKK'ê wek sebebê sergirtinê hatibû nîşandan.
Ji hêla din ve Buroya Hevkarî ya bi DEP'ê re li Brukselê, daxuyand ku ev helwesta dewleta Alman, li dijî kurdan û saziyê wan, ji zû de dewam dike.

### Taqdîrnameya ARGK'ê

Qumandariya ARGK'ê ya Sehaya Başûr, ji bo qehremaniya gerîla li gundê Serxetê, ku bi navçeya Sêrtê Dihê ve girêdayî ye, nîşandaye, ew bi taqdîrnameyê xelat kirin.
Di 9'ê Sermawezê de gerîlayên ARGK'ê, li Serxetê êrîşî qereqol û xaniyên cerdevanan kiribû. Di sergirtina gerîlayan de zêdeyî 50 eskerî miribûn û gelek muhîmatê eskerî ketibû destê gerîla. Di van muhîmatan de du hawanên 60 milîmetre û topeke 57 milîmetreyî jî hebûn. Qumandariya Sehayaya Başûr, ev xelat da hemû şervan û qumandarên Yekaneya (unite) Yekemîn a Tabûra bi Hereket ya Duwemîn a Alaya bi Hereket ya Eyaleta Botan-Behdînanê.
Di mesaja takdîrnameyê de hate diyarkirin ku Dewleta Tirk, piştî operasyonan ji raya giştî ya xwe û ji ya dinyê re dibêje: "Min PKK pelçiqand".
Daxuyandin wiha diqede: "We, bi vê livbaziya xwe ya Serxetê, ev derew û propagandeya dewletê pûç kir. Cesaret û fedekariya di vê bûyerê de bûye serkeftin. Ev serkeftin şayanî takdîrê ye."




KOMA XANÎ

**Sala çûyî li Rojavayê Kurdistanê pêşbaziya çîrokan li dar ket. Di vê pêşbaziyê de Ferhat Çelebî bû pêşbirê duyem û xelat stand. Em vê çîroka xelatgirtî pêşkêşî xwendevanên Welatê Me dikin.**

# ÇENTE

Bi xire cir ket fargona trênê, çenteyê xwe avêt ser kursiya li hemberî xwe... rûnişt.. keserek veda û ...( Hema va ye min derbas kirin, ma ka çi bû...?)

Fize fize bayê li derve, tevî peşkên baraneke ne xweş, tu dibê senfoniya mirinê lê didin... Trênê jî wek termekî bêcan ê reş î dirêj li wê navê vezilandiye, li hêviya kefenê ku bikevê ... û di tariya şevê de bê veşartin e../ firrrr... dengê fîkandina wê wek fîkandina pasvanê şevê, dema ku bi tengezarî û tenêbûnê sebra xwe bi wî dengî tîne, dengekî neşaz(1) di wê senfoniyê de peyda dike.

### Tirsa Msto

Tevzînok bi laşê Misto hatin. Serma ye, destê xwe di hev û din dan, cixarayek derxist, bi agirê wê destê xwe germ dike. Di demên wisan de zivistan e rêwing kêm hene. Nemaze ji Helebê ta Qamişlo. Tu kes nehat kursiya hemberî Misto, wî di dilê xwe de got: "Baş e ku kes neyê, ev ji min û çentê min re ye..." Deriyê vagonê vedibe, bayê sar derbas dibe.. Misto xwe bi ser hev de diqurmiçîne, da ku hinekî germ bibe.. veciniqî û li çenteyê nêrî, di bin simbîlen re kenî û çavên xwe girtin... Şike şika trênê panavake mezin ji ramanan re diafirîne, bi taybetî ji yekê wek Misto re, ku cara yekemîn e bi karekî girîng û xedar rabûye. "Hema ji min re digotin te hay ji xwe hebe... li xwe miqatebe, ku kes nêzîkî çente bibe, bixwaze veke xwe lê neke xwedî... bila çenteyê te bibin, çi dikin bila bikin xwe neke xwedî, lewre a girîng ev e ku nizanibin çente yê te ye..." Xewê avête ser çavê Misto, çaketê xwe li xwe gerand, destên xwe xiste bin serê xwe û... (çi gava minê bigota tişt tuneye, dem hatiye guhartin, nema dikarin tiştekî bikin, bila dilê we di cih de be...) û / Misto çente zeft kiriye, tu dibê pêncî mirov lê civiyane lê doza çente dikin û ew bernade, Xwêdanek wî diçe û yek tê. Dilê wî wek dahola Miho lê dide. " Dema ku ez ketime trênê çavên wî ji çenteyê min dûr neketiye... bi xwedê kî ji min re bêje, ev polîs e..."Misto di dilê xwe de digot... Zilamê çavnêriya Misto dikir ber bi wî hat... dinya li ber çavê Misto reş bû, nema tiştek ji hev derdixist, her wiha dilê wî bi xurtî li parsiyên wî dida. Wek çîvîkekî ku dixwaze ji rikêhê derkeve...

Misto nema dizanibû çi bike... hino hino zilam nêzî wî dibe... ka ew dê çi bike ? Çente bavêje yan bihêle ? Raman di serê wî tekil hev dibin. " Ma ezê çi bibêjim, ezê bibêjim çi ? Ezê bibêjim ev çente li vir bû min pala xwe dayeye, ez bi xwe nizanim bê çi tê de ye. Erê erê divê polîs bawer bike ku min di jiyana xwe de qet derew nekirine. Polîs jî vê yekê dizanin. Wisa jî ew ê ji min bawer bike" got.

Ew zilam li tenişta Misto rûnişt, çavên wî zoq li çente dinêrî . Misto jî dilerizî û di ber xwe de got : " Nabêje çente veke da ku tesdîq bike ku çente yê min e, bi xwedê ez nahêlim ew nas bike, ez wê tirê ji vî zilamî re nahêlim" Zilam çavên ji çente ranake. Misto wiha fikirî "Divê çareyekê jê re bibînim, eze çente li şûna xwe bihêlim û herim vagonekî din, biu xwedê ji wê çêtir rê tune ye, lê divê ez xwe lê vedizim"

**Misto çente zeft kiriye, tu dibê pêncî mirov lê civiyane lê doza çente dikin û ew bernade, Xwêdanek wî diçe û yek tê. Dilê wî wek dahola Miho lê dide. " Dema ku ez ketime trênê çavên wî ji çenteyê min dûr neketiye... bi xwedê kî ji min re bêje, ev polîs e...**

Di vagona din de misto li cihekî vala rûnişt, bêhna vî derket, lê tevî vê yekê jî dîsa reht bû "Gelo baş bû min dev ji çente berda, yan na ? Sibê wê heval çi bibêjin ? Karekê wisa biçûk û hêsan sipartine min û min ew nebir serî..." Zilamê me ji wê derê derket, çente di destê wî dabû, berê xwe da Misto got: " Ma ev çente ne yê te ye?"

Wek tu kunek ava sar bi ser serê Misto de vala bikî, behetî, mat bû, hêz da xwe û got: " Min xwest cihê te fireh bikim, belkî tu ji xwe re razabûya."

Misto ji qazî ve çavên xwe girtin û kire xire xir, yek caran di bin çavan re li zilamê li kêleka xwe dinêre. Hêdî hêdî çavên zilam dihatin girtin, her du kapaxên çavên wî bi ser hev ve dihatin. Misto jî xire xira xwe bilindtir dikir. Li westgehekê trên rawestiya û çavên zilam hatin girtin bû xir e xira wî.

### Ezê derkevim derve

Misto vegeriya ramanên xwe " Divê ji hevalan re rûve bikim ku ez ji wan jîrtir im, ev delêva min e ku ez riwê xwe spî bikim. Bi aramî bê xire cir xwe vedizî, kir ku dakeve, lê dengê wî zilamî, ew ji desthilanînê xist: " Ma tu çenteyê xwe nabî ? "Misto di dilê xwe got: " Hema ez kela dilê te hênik nakim, nahêlim tu çente di dest min de bigirî.." û ev zivirî ser zilêm got: Ez danakevim ezê derkevim derve!" Tu tişt nekir, şarwarê xwe li kir, destên xwe şûştin û derket, vegeriya cihê xwe. Di dilê xwe de got : " Bes tirên bileqe, ezê li vê deverê xwe jê bavêjim û bila ew çente lê pîroz be. Wê heval tev mat bimînin, dema çîrokê bibîzin wê gelek ji hevalan xweziya xwe bi dilê min bînin" Li ber dergehê trênê rawestiya, trên meşiya, xwe amade kir ku xwe bavêje. Çavên xwe girtin ... û... yekî destên xwe li milên wî xist û bi tinazî gotê –Birako rabe ser xwe lo, va ye em gîhan Qamişloyê bavo...

**FERHAT ÇELEBÎ**

# DEFTER

## Konferansa YRWK'ê



AMED TÎGRÎS

Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) di navbera rojên 19–20.11.1994'an de, li Almanyayê, li bajarê Kolnê konferansa xwe ya çaremîn çêkir. Di konferansa çaran de çend tiştan bala min kişandin. Yek jê, li gorî konferans û kongreyên berê hejmara rewşenbîrên mêvan û nûneran gelek zêde bû. Bi yên kevin re gelekî rewşenbîrên nû cara yekemîn bû ku beşdarî konferansê dibûn. Bi dîtina min, ev nîşana bilindbûn û geşbûna têkoşîna neteweyî ya ku li welêt tê meşandin e. Bêguman ev yek tesîreke mezin li ser rewşenbîrên ku heta niha bêdeng mane jî dike. Dereng be jî, ew dixwazin li doza gelê xwe, xwedî derkevin. Ev pêngaveke pozîtîv e.

Ya duyemîn di konferansê de, bi awayekî vekirî û berbiçav xuya dikir ku rewşenbîrên Kurd ên ku hatine asîmîlekirin, di van salên dawî de, ji bo hînbûna zimanê Kurdî hewl û xebateke dijwar dan û didin. Di kongre û konferansên berê de gelek nûner û mêvan bi Tirkî diaxivîn. Di vê konferansê de, Tirkî nehatibû qedexekirin; lê, hatibû jibîrkirin. Di şûna Tirkî de, sê diyalektên Kurdî –Kurmancî, Dimilî, Soranî– dihatin bikaranîn. Tiştekî din î ku gelek balkêş jî, ev bû; du sal berê, çend nûner hebûn ku bi Tirkî diaxivîn; lê di vê konferansê de, ew çawa Kurdiyeke pak û çak hîn bûbûn! Bi rastî ez matmayî mam û ez gelek bi vê rewşa wan dilxweş û şa bûm. Ez hêvîdar û bendewar im ku, ew kes wiha ji Kurdên din ên ku bi Tirkî diaxivîn re jî, bibin mînakên bixwebawerî û serkeftinê.


Di konferansê de, bi awayekî berfirehî û kûrahî li ser pirsên zimên, edebiyat û kultura Kurdî hat sekinîn. Ji bo parastin û pêşxistina van pirsan daxwaz, pêşniyarî û biryar hatin girtin. Wekî vekirina kursên bi Kurdî, perwerdeya mamosteyên zimanê Kurdî, xurtkirina weşanên bi Kurdî û hwd.

Belê, di nav van pirs û babetan de, bi xwezayî pirsa rojnameya Welat jî hat zimên. Konferansê da xuyakirin ku bi rawestandina rojnameya Welat di warê rojnamegeriya Kurdî de, valahiyeke mezin derketiye holê. Di vî warî de dilêşiyên xwe anîn zimên. Lê belê, ji aliyê din ve, nûnerên konferansê, bi derketina Welatê Me re jî, dilxweşî û şabûna xwe dan diyarkirin.

LÊGERÎNERÊ ÇANDA KURDÎ, WÊNESAZÊ KURD MUHEMED BAHADÎN:

# BILA BI RENGÊN ALA ME BIHESE HEMÛ DINYA

**• Jînenîgariya Muhemed Bahadîn**
Hunermend di 1970'yî de li bajarê Silêmaniyê hatiye cîhanê. Ji sala 1985'an ta bi 1994'an beşdarî 14 pêşangehan bûye. Bahadîn pêşangehên xwe li başûrê Kurdistanê, Iraqê, Almanyayê, Tirkiyeyê, Swêdê û hwd. vekirine. Ji hêla din ve li Iraqê di sala 1990'î de Xelata Grafîkê standiye. Ew endamê Yekîtiya Hunermendên Kurdistanê (li başûrê Kurdistanê), Desteyê Temî Hunerî û Navenda Çanda Mezopotamyayê ya Şaxa Hewlêrê ye.



Ressam Muhemed Bahadîn

**Ew rewşa û şertên ku ez tê de jiyame, min xwestiye bixime ser tabloyan. Min ew êş û azar bi nîgaran kêşandine. Bi vê yekê jî hunereke nû derketiye. Gelek jê bawer nakin ku ev hunera min e. Ji ber ku ez ji bo wan biçûk têm hesibandin. Lewre temenê min 24 sal ın. Cudatî di nav herdu aliyan de heye. Mirov di kîjan rewşî de bijî, ew bandora xwe li mirov dike.**

Hunermend Muhemed Bahadîn, di nav meha Kewçêrê (Cotmeh) de, pêşangehek bi navê "Li Xerîbiyê" li Stenbolê, bi mebesta salvegera çaremîn a avakirina NÇM'ê li Navenda Çanda Mezopotamyayê vekir.

Ew bi xebatên xwe yên "şêwekarî" derketibû pêşberî gel û digote me ku ev hunereke nû ye.

Tabloyên wî bi nexş û nîgarên Kurdî hatibûn arastin, ên ku li ser xalî, xalîçe, ber, emenî û hwd. Berhemên xwe jî li ser wan raxistîbûn.

Rengên alê di berhemên wî de wek ên hunermendên me yên din bêhtir li pêş bûn.

Abstraktbûna xwe jî bi vî terhî dianî zimên: "Ez dixwazim bidime zanîn ku Kurd dikarin di warê hemû celebên hunerên bedew de berheman biafirînin."

Bahadîn diyar dikir ku mebesta wî ne ew e bi tenê hunerê li gorî gihîştîbûna gel û xizmeta wî çêbike, digot ku, "..... divê huner hinekî di xizmeta huner de be jî."

**Tu dikarî ji me re bibêjî, ji ber çi tu bi sê awayî dixebitî?**

Ji bo ku ew xelkên tên pêşangehê bibînin, bizanibin ku hunermend pir tiştî dizane, tecrûbeyên wî yên hunerî hene. Bibîne ku dikare bi rengê donî (pastel), rengê avî, grafîk û şêwekariyê jî bixebite û bi wan dizane.

**Dema ku tu dibêjî, "hunera şêwekarî" daxwaza te çi ye?**


Hunera şêwekarî wek hunereke realîzmê ye. Zemanê me berepêş çûye. Zarûrî nîn e ku hunera şêwekariyê tehlîla miroveki bike. Pêwist e tehlîla şaristaniyê bike. Huner jî berepêş çûye. Li hemû cîhanê hunereke mucerret (abstrakt) heye. Pêwist e ku hunera Kurdan jî a wiha hebe.

**Di vê pêşangeha te de, yek–du xebat ne tê de temaşevan rastî şeklê mirovan nayên. Gelo bi şeklan tu dixwazî çi bidî mirovan?**

Her tabloyek behsî tiştekî dike. Di her yekê de babetek heye. Ne pêwist e ku hunermend bi xwe ji temaşevanan re behsî babeta xebata xwe bike.







Di tabloyên Muhemed Bahadîn de, xêzên abstrakt (nedîtbar) serdest in.

www.arsivakurd.org

# CEMÎL HORO AN JÎ HÊSRA DARÊN ZEYTÛNÊ



Sebebek heye ku te ji xwe re terzekî abstrakt niqandiye? Wênesaz Guhdar Selahedîn di hevpeyvîna xwe de digot ku,"Mercên xedar kiriye ku ezbi awayêabstrakt dixebitin" Ji bo we jî tiştekî wisa heye?

Belê rewş dikin ku hunermend ber bi pêleke hunerî ve here û xwe pê derbibe. Wek xebitîna bi awayî abstrakt. Lê min xwest ku xelk ji tabloyên min bi xwe maneyekê derxe. Divê êdî ew jî bizanibin ku ev hunereke nû ye û hunera Kurd bi pêş ve diçe.

**Di tabloyên te de pirtir rengên alê xwe didine pêş. Ev yek bi taybetî an jî tesadûfî ye?**

Na ne tiştek tesadufî ye. Min bi xwe rengên alê hilbijartin. Ez dixwazim ku hemû dinya bi rengên ala min bihese. Peywist e ku hemû Kurd vê yekê bikin û pê şanaz bibin.

**Kîjan hunermendî li te bandor kiriye, tu li ser kîjan rêbaza hunerî de diçî?**

Matês û Kandenesky bi min xweş in. Lê tablo min bi xwe çêkirine, çanda min li min bandor kiriye. Hunermendekî me heye, Omer Hemdî, bi min ew hunermendekî baş e.

**Tu hunermend Muhemed Arîf, İsmaîl Xeyat, Malva, çawan dibînî?**

Ew baş in, her yek ji wan riyên xwe temam kirine, bûne mamoste. Wan bi rastî xizmeta hunera Kurdî kirine.

**Tu dikarî navê Kurdekî wênekar bidî me ku di cîhanê de gelek tê nasîn?**

Hunermendên Kurd ên gewre hene ku li cîhanê tên naskirin. Alî Selîm hevalê Pîcaso bû. Hemû cîhan wî dinase. Tabloyên wî li muzeyên Moskovayê, Îspanyayê, Amerîkayê, Parîsê hene. Bi rastî hunermendekî cîhanî ye.

**Hevpeyvîn:**
**ZANA FARQÎNÎ**

**Ji ber jiyana reş gelek nexweşî pê re çêbûbûn. Wek; derdê şekir û telikê. Piştî ku zikê wî diqelişînin, dertê ku kezeba reş pê re werimiye. Dilevînê welatê xwe Cemîl Horo, berî ku çavan cara dawî bide hev, ji kurê xwe yî mezin re dibêje: "Eger ku rojekê Kurdistan ava bû, .... Kurdistaneke aza û serbixwe, divê tu werî ber serê min, di gel hunermend, şaîr û sema û lîliyan û tu bêjî min, "De rabe... de rabe... raabee!"**

Rojekê yekî Rojhilatnas ji bo Kurda wiha digot: "Her Kurdek dengbêjek e." Lê her dengbêj nikare hêsrên pelên darên zeytûnê biweşîne. Cemîl Horo, hunermendê yekemîn ê Efrînê, yek ji ew ên kezebreşkirin, ji qîrîna di rûyê 'feleka bêol' de heya roja ku bi 'mirineke zer' ji nav me bar kir, banga wî ev bû 'gula wî ji bin milê reş derînin.' Lê ka bila jiyana wî ji we re biaxive û her ku yê di ber goristana Henên re dibore dengê wî ji kûraniya gorê dibihîse, ji wan tê xwestin ku 'milê reş ji ser rakin.'

Jiyaneke wî ya balkêş hebû. Hunermend di temenê xwe yî deh salî de dest bi strandinê dike. Dema Feqîtiyê, gava jê tê xwestin ku ayetek ji Quranê bixwîne radibe sirûda Filîstînê distre û riya xwe dibijêre.

Wî heya salên 1960–61'î li dawet û şahiyan stranên folklorîk digotin. Di van salan de (60–65) li tomargeha (stutyo) S. Kamîl li bajarê Helebê hin stranên folklorîk dadixe ser sêlikan (plakan). Wek Memê Alan, Feteh Beg, Ûsib Şer, Xana Dînê, Eyşa Îbê, Dizo, Tosino, Wey Lawo, Bavo...

Piştî wê demê, salên 1970'î, ji ber karê xwe yî siyasî ji Suriyeyê direve Tirkiyeyê. Di wê demê de ew û Eyşe Şan hev dinasin û bi hev re sêlikekê di gel Kemal Urgun (hunermendekî ji Kurdên Bakurê welêt) tomar dikin. Ji wan re Arif Sağ li tembûrê (sazê), Bilal Selman jî li klarnetê dixe. Ji aliyê din ve ew û çend hunermendên Kurd û Tirk bi tekirman radibin hev, wek Nuri Sesigüzel. Ew bi Tirkî distrên û Cemîl Horo jî bi Kurdî. Dawiyê kumê xwe ji dengbêjê me re datînin.

Gava ku derbasî nav pêşmergeyên Berzanî dibe, tesîreke mezin lê dibe û di stranên wî de guherîn çêdibin. Stranên bi navê Leyla Qasim, Şêx Seîd, Ebro Kevan, Keça Kurda, Berzanî, Pêşmergê Kurd, Newroz, Delalê Milanî, Ay Felek, Felek, Gula Nesrînê...

Di salên 1974–75'an de Mîhrîcana "Soq–întac" çêdibe. Cemîl di gel hin hunermendên Kurd û Ereb distre û dû re diçe Lubnanê. Di sînemaya Rîvolî de di gel hunermendên wekî Seîdko, Seîd Yûsif, Şîrîn, Sêvî Metînî, Koma Efrînê ya Semoyê (govendê), hunermendê nemir Mihemed Arifê Cîzrawî, ji bo Cejna Newrozê şadîmaniyekê bi cih tînin.

Cemîl Horo, jiyaneke pir dijwar derbas kir, surgunî, êş, jarîtî **û tengas**iyên mezin dîtin. Ji bo debara maliyên xwe gelek karan dîke. Di dawiya emrê xwe de nexweşiya şekir, wî ber bi mirinê dibe. Cemîl Horo, ji bo nexweşiya xwe navek daniye: "Kula leklekê." Di êvara pêncşema 17.9.1989'an de xatirê xwe dixwaze. Li Goristana Henên di gel Nurî Dêrsimî tê veşartin.


**PÎR RUSTEM**

www.arsivakurdi.org

# JI BO ZAROKAN

Zarokên şîrîn, heftiya borî min gotibû ezê xebereke xweş bidim we. Ev rûpel ji bo we ye. Hûn çi bixwazin ezê ji bo we binivîsim. Lê her tim li benda nivîsên min nebin. Hûn jî binivîsin. Çîrokan, helbestan metelokan û resiman ji bo vê rûpelê bişînin. Hingê hûnê di vê rûpelê de nivîsên xwe bixwînin û resimên ku we çêkirine, bibînin. Vê heftiya ji bo we min li ser mafên zarokan nivîsek hazir kir. Ev peymana mafê zarokan e. Ew ji aliyê hemû dewletên modern ve hatiye qebûl kirin. Hê jî Tirkiyeyê îmze neavêtiye vê peymanê. Yanê hê jî dewleta Tirk van mafên zarokan bi temamî qebûl nake. Lê ew qebûl bike neke, ev şertên di peymanê de mafê hemû zarokên dinyayê ne. Peyman gelek dirêj bû. Ji ber vê yekê ez bi giştî nanivîsim. Tenê madeyên zehf girîng min ji bo we nivîsandine. Lê dîsa jî hinek dirêj e. Vê heftiyê naqede. Heta heftiyeke din bimînin di xweşiyê de. Ji bîr nekin, vê rûpelê bixwînin û hûn jî, ji min re binivîsînin.

**Mamoste ZOZAN**



# Li ser mafên zarokan peymanên navneteweyî

**1924–** Destpêka derxistina qanûnên parastina zarokan (Cenewre)

**1959–** 10 biryar (deklerasyon) li Yekîtiya Miletan ji bo parastina mafê zarokan hate pejirandin.

**1979–** Sala zarokan li cîhanê hate pejirandin û pêşniyar hatin kirin ku heqê zarokan bête parastin.

**1989/90–** Bi pêşniyariya Swêdiyan qanûnek ji bo parastina mafê zarokan hate çêkirin, 28 welatan ev qanûn pejirand û qanûn li gelek welatên din tê .qebûlkirin.

**Wê bidome**

# NAMEYÊN XWENDEVANAN

## Pîroz be Welatê Me

Diwêne Welat û emro Welatê Me wekû berdewamiye boy. Ser le niwe taqane şox û şengenekey naw rojnamegeri Kurdî depişkiwê û be nûsîne pir mana û be pêzekani zimanî Kurdî parawtir û dewlemendtir dekat...

Wekû lay hemûwan run û aşkira ye le dîrokî dûr û dirêjî rojnamegerî Kurdî da bo carî yekem e ke rojnameyêk le bakurî niştimane xoşewistekeman da le bergewe bo berg be zimanî Kurdî derbiçêt... De ba hemû roşinbîran û nuseran û xwêneranî Kurd baweşî mîhir û xoşewîstî bo Welatê Me bikeynewe û lêy xudî derkewîn le ber ewey derçûnî rojnameyek be zimanî Kurdî û le pêvajoyekî wa da, xoy le xoy birîtiye le dirust kirdinî dîrok.

Pê qedemit be xêr Welatê Me, derkewtinî to mujdehênî azadî û serbexoyî ye... Selaw le karmendanî Welatê Me û dubare pîroz bê.

**Bekir Bahoz / Atîna**

## Peyvêk... Bo cejnî le dayîkbûnî Welatê Me...

Nalî witî: "Kes be elfazim nelê xo Kurdî ye, xo kirdî ye. Her kesê nadan nebê xoy talibî meina deka."

Ew rojey ke biryarî westandinî rojnamey "Welat" î tiya dira, min hest im be nameyêkî fire mezin kird, nameyêk dûr le kef û kul, hest û sozêkî herzeyan e, wan dezan gelî Kurd şitêkî gelê gewrey le dest dawe. Be rastîş her wa ye, gelo debê le rewşî emroy bakurî Kurdistan da gelî Kurd bêrojname bin

Ew le kar kewtiney rojnamey Welat, witekey Turgut Özal manî bîr dexistewe ke witbwî:"Wayzan lê bihênin û rêyan pê biden, ba rojnamey Kurdî derbiken, çunkî serkewtin be dest nahênin û her xoşyan daydexen."

Belam em ro le cejnî le dayîkbûnî rojnamey niwêy Welatê Me da ke deste xweşkêkî qeşeng debêt bo welat, Nalî witênî dête selmandin ke zimanî Kurdî xo kirdî niye û zimanekî resen e eger dijminan bihêlin le zimanî ewan ziyatir nebêt kêmtir niye.

Diyar.e le barî siyasî û komeleyetî em roy Kurdistan da derkewtinî Welatê Me gelê manay gewre be xo ra dênê gewretirînyan... Be Özal û seranî bîr teskî Tirk dilê : Şekirtan xward !! min dîsan sitranî serfirazî be gel û şehîdanî Kurdistan debêjim û wize le xwênî şehîdanî ew gel e xoragirewe wer degrim.

Em ro be derçûnî Welatê Me rohî bawegewrey rojnamey nû Kurdî man Bedirxan Begî gorbeheşt hest be şadî û serberziyekî gewre dekat.

Êmeş dilêyin: Kurdino Welatê Me, yanî welatê xwe bigrine amêz... Mirov be welatî xo we be nirix û hêja ye.

**Sîrwan / Atîna**

## Gundên şewitî û Medya

Li ser şewitandina gundan tu caran medya wek vê carê nesekiniye. Valakirin û şewitandina gundan ji aliyê hêzên dewletê ve li her deverê Kurdistanê didome. Van rojan bi giranî li herêma Dêrsimê ev kar pêk anîn.

Hêzên dewletê êdî bi eşkere gundan vala dikin û dişewitînin.

Operasyonan bi ser gundan û daristanan ve pêk tînin, bi vî awayî derya ziwa dikin. Ji bo masî bêav bimîne û bimire. Lê vê carê plana wan neçû serî. Qêrîna Dêrsimê bêhemdê wan bilind bû. Xwestin ku vê qêrînê bifetisînin, bêdeng bihêlin û ji ber çav rakin. Serokwezîr, wezîr û general dibêjin: "Gundan ne hêzên dewletê dişewitînin. Endamên PKK'ê yên cilên leşkeran li xwe kirine dişewitînin."

Gundî dibêjin; "Hêzên dewletê hatin û gundê me şewitandin."

Genaral û waliyê taybetî dibêjin: "Gundî malê xwe dişewitînin ku tezmînatê bistînin.! (Heya îro ji bilî cerdevanan kesî tezmînat nestandiye)

Muxtar û komek ji gundiyên Dêrsimê çûn Enqerê cem Serokwezîra dewletê, hovîtiya hêzên dewletê jê re diyar bikin. Jê re dibêjin: "Hêzên dewletê bi top û balefiran gundê me dişewitînin. Gere hûn wan bisekinînin".

Serokwezîr bersiva wan dide: "Hêzên dewletê gundan naşewitînin! Ew balefirên ku we dîtine an yên Ûris in, an jî yên Afganîstanê ne."

Pişt re serokwezîr ji gotina xwe dizîvire. Dibêje: "Ev ne gotina min e. Tiştê min got ev e: "Dibe ku di destê PKK'ê de jî balefir hebin" .

Ez jî dibêjim: Ne balefirên Ûris û ne balefirên Afganî ne, ew balefirên Icîniyanê ne.

**İsmet Golan**



www.arsivakurdi.org



## Ji Welatê Me

**Mazhar GÜNBAT**

# Di dîroka Kurdan de destpêkeke nû

Hejmara duyemîn a Welatê Me di salvegera rojeke tarîxî de derdikeve. 27'ê Sermaweza 1978'an roja avabûna Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Di tarîxa Kurdan de gelek rojên binavûnîşan hene ku tên bibîranîn. Rojên ku tên bibîranîn an jî pîrozkirin ew in ku bi awayekî tesîr li herikîna jiyana gelan kirine û rûpelek di deftera dîrokê de veqetandine ji xwe re. Pêgava ku li Gundê Fîsê hate avêtin bêguman di dîroka Kurd û Kurdistanê de rûpeleke nipînû vekir û bû destpêka tevgera neteweya Kurd ya herî direj, herî birêkûpêk, herî bihêz(biqewet) û dorfireh. Ev partî li 27'ê Sermawezê ji aliyê Abdullah Öcalan û çend hevalên wî ve hate damezirandin (avakirin) û li hember Komara Tirkiyeyê têkoşîneke dijwar, biîdîa û bêhempa domand, hîn didomîne. Komara Tirkiyeyê ya ku beriya avabûna PKK'ê 28 îsyanên gelê Kurd bi jenosîd û hovîtiyê perçiqandibûn, di 16 salan de li hemberî hêza vê partiya Kurd a nû, nikaribû bigihîje armanca xwe. Îro dewletên ku Kurdistan îşgalkirine jî qebûl dikin ku hêza vê partiyê qedera Rojhilata Navîn diguherîne û gelek dewletên Ewrûpayî jî ji mecbûr di rojeva xwe de cih didin tevgera PKK'ê û pirsgirêka Kurdî. Guherînên li cepheya dijberên Kurdan li aliyekî, guherînên esas û girîng bêguman li cepheya Kurdan û di şexsiyeta gelê Kurd de xwe nîşan dan. Kurdên ji her aliyî ve asîmîlekirî ku ji bo hêka mirîşkekê dikaribûn xwîna hevûdin birijînin, piştî avabûna PKK'ê bi giştî jiyana xwe guhertin û hesta neteweyî li nav wan xurt bû. Mirov dikare bibêje ku di 16 salan de mêjî û giyana gelê Kurd di nav şerê neteweyî de guherî. Nirxandina 27'ê Sermawezê di vî qunciki teng de ji xwe ne mumkun e biberfirehî bête kirin, bes lazim bû di ser rojeke wisa muhîm û dîrokî de jî gav nehata avetîn û bi çend gotinan be jî ew roj bihata bibîranîn.

**Şeva Danasînê**

Roja 21'ê mehê şeva Welatê me bi geşî û şahî buhurî. Me gotibû û em dibêjin Welatê Me rûmeta me ye, xwendevanên me yên li Stenbolê jî di şeva me de em bi tenê nehiştin. Ji hejmara ku me hêvî dikir, zêdetir xwendevan, dost û welatpêz hatibûn şevê. Em spas dikin ji hemûyan re. Hêviya me heye ku ew ji aliyê xwendin û danxwendinê de jî vê piştgiriya xwe her tim bidomînin.

**Belavkirin**

Welatê Me ji hêla şirketa belavkirinê (BBD) ve tê belavkirin. Gerek e li cem hemû bayiyan-ku ne yên zehf biçûk bin- hebin. Ku dîsa jî hîn bayî ji we re bibêjin 'Welatê Me nayê ba me' an jî ew bi zanabûn nexwazin bifiroşin ji kerema xwe re adresa wan ji me re bibêjin.

**Nivîsên Kurt û Dimilî**

Nivîsên ku hûnê ji me re bişînin ji kerema xwe re bila tu car ji rûpelekê ne zêdetir bin, lê ku kurtir bin ji xwe hîn jî çêtir e. Li aliyê din çiqas emê rojnameyê bi sê zaravayan derxînin jî niha di destê me de nivîsên bi Dimilî tunin di rûpelan de jî vê heftiyê tenê Kurmancî û du nivîsên soranî cih girtin. Dema we xweş be ta heftiyeke din.

# Çetetî û Wanspor

Di sala 1990'î de Mahmut Yılbaş bû Serokê Wansporê. Mebesta wî bi sporê xapandina gel bû. Li Wanê meyla hinek bazirganan jî li ser sporê hebû; ev jî ji Mahmut Yılbaş re bû hincet. Êdî spor jî ji dewletê re dibû aletekî şerê psîkolojîk.

Niha li gelek kuçe û kolanan navenda Wanê, hinek afîş bi ber çavên mirov dikeve. Li ser wan wêneyên zarokên ku bi destê kontrgerîla hatine kuştin û di ser wan jî wêneyan re jî, wênêyekê Serokê PKK A. Öcalan tê ditîn. Li gorî wan afîşên qirêj A. Öcalan bi mirina zarokan kêfxweş dibe. Herkes dizane ku ev afîş bi destê zilamên M. Yılbaş hatine daliqandin. Yanê M. Yilbaş di şerê psîkolojîk de evqas jîr e.

Dema wanspor di lîga duyemîn de bû, M. Yılbaş û hinek mirovên wî bi destê zorê Wanspor derxistin lîga yekemîn. Pişt re, ji nişkav ve stêra Wansporê geş bû. Wansporê bi taybetî piştî maça bi Fenerbahçe (F.B) re, navûdeng da. Wanspor di vê maçê de qalek bi ser F.B'ê xist. Êdî Wanspor di nav rûpelên rojnameyên Tirk de bûbû mijara sereke. Dewletê hemû medya li Wanê civandin û li wir şevek bi pêşengiya giregirên dewletê li dar ket. Çapemeniya Mehmetçikan digot: "sporê rê li ber terorê girt", lê hêzên Komara Tirk li Kurdistanê şewitandin û rûxandina gundan didomandin.

Dewlet ji bo ku gel ji şerê azadiyê dûr bixe, alikariyeke mezin dide Wansporê. Waliyê Wanê M. Yılbaş Ji bo Wansporê baçeke (vergi) taybet derxistiye. Her meh ev bi xwe li ser hemû esnaf û bazirganan digere û ji bo Wansporê alîkariyê berhev dike. Dîsa her meh, ji bo Wansporê ji meaşên çeteyan 2 milyon têbirîn. Meaşa çeteyakî 4 milyon in, dema 500 hezarî jî mixtar dest deynin serê jê re dibîne milyonûnîvek. Êdî buhayê xwîna xwîn cehşan ewqas erzan bûye.

Wisa dixuye ku heke firsend têkeve destê çeteyan vê yekê ji M. Yılbaş û Wansporê re nahêlin. Dibe ku stêrka wan jî bi destê çeteyan bixurice.

**CEWDET QÛŞMAN**

# 'Ez şîv im tu jî firavîn'

Gotina pêşiyan e: "Serê bênamûs, nakeve tu cihî!.." Ji rastiya vê gotinê re, ma guman heye? Serê bênamûs û bêxîret, kî dikare, di ku de bi cih bike? Baş xerab, kes heye ku wî serî ji canûdil biecibîne?..

Mirovê herî bênamûs jî ji yekê re tune, ku bêje erê!.. Bersiva vê pirsê her na! ye... Lê ev gotin çendî li bejna cehş û nokerên me Kurdan-tê, Xwedawo!!. Çendî lê tê... Mirov wisa dizane ku bi taybetî ji bo wan hatiye gotin.

Ji roja roj û heta îro bi vî rengî hatiye: Kengê raperîneke Kurdan çêbe...

Kengê neyarên Kurdan bikevin astengiyê... Wê gav û wê saetê, dest davêjin cehş û nokerên Kurdan û karê xwe yê pîs û lewitî bi wan didin kirin.

Û dema neyarên Kurdan ber piyê xwe nas dikin. Ji reşiyê derdikevin, dikevin xweşiyê... Wê demê jî, şûrê xwe ji bo serê cehş û nokeran hildidin jor!..

Çîroka Emînê Perîxanê baş tê zanîn Di mala xwe de, li ser şîvê birayê xwe digire, dest û pê lê girê dide û dide destê neyaran... Ku leşker wî dibin, li paş xwe dizivire û ji Emîn re dibêje: "Ez şîv im, tu jî firavîn!."

Dema dawiya şer tê û Kurd tên şîkandin, Emîn jî digirin.

Leşker, wî ji Êlihê (Batman) dibin ku têxin Hepsa Sêrtê.. Lê di rê de, li ser kaniyeke nêzîkî gundê Telîba, dema Emîn nimêj dike ji paş ve û li ser nimêjê wî dikujin!

Îro jî cehşê Kurd, ji bo miletê xwe, di destê neyarê xwe de bûye şûr!.. Çi karekî wan ê pîs û lewitî hebe, dîsa bi wan didin kirin...

Rojek zûyek dereng, wê her dawiya vî şerî jî were... û di dawiyê de, ji bo cehş û nokeran jî her zerar e. Çi Kurd bibe serkeftî û çi neyarê Kurd... Ji bo zanîna vê ne hewce ye mirov dûr here, Alaaddîn Kanat wa ye, li ber çavan e...

Tahirê Kero (Adiyaman) ma nizane ku wê di dawiya vî şerî de, çi were serê wî? Wê kuştina heşt leşker û dozgerekî (sawcî) xwe ji bîr bikin gelo? Wisa dizanin ku îro çi dikin û çi bikin, wê ji wan re kar bimîne. Lê ev hêvî ji xewnekî şevan tewştir e...

Îro hemî tiştê ew dikin, yek bi yek tên hejmartin û ji bo paşerojê tên veşartin. Dibe ku çend kesên wek Kamuran Înan, bikaribin ji wan re aqilmendiyê bikin, bifilitin. Lê yê wek Kamuran jî, ji tiliyên destekî naborin...

Zanin, çi were gotin, nakeve serê wan... Vala ye...

Mamoste îsmaîl Beşîkçî di nivîsên xwe de dibêje: "Kurd bêbîr in."

Rast e Kurd bêbîr in...
Lê cehşên Kurd:
Ew bêbîr in...
Bêxîret in...
Gêj in...
Bêhiş in...

**RAHMÎ BATUR**


**WELATÊ ME**

Li ser navê
ROZA Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
**Aynur BOZKURT**

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
**Mazhar GÜNBAT**

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran
(Yazıişleri Müdürü)
**Mehmet GEMSİZ**

Berpirsiyarê Nûçeyan
(Haber Sorumlusu)
**Suut KILIÇ**

Redaktor
**Sami TAN**

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî
(Halkla İlişkiler Müdürü)
**Sıraç AKSOY**

**NAVNÎŞAN (Adres)**
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL


**TEL-FAX**
249 13 44 – 245 29 91

**ÇAPXANE**
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

**NÛNERÎ**
**(Temsilcilikler)**
**Hewlêr–** Niwa Hebîb
**Suriye–** Jan Dost
Fener Rojbiyanî
**Berlin–** Abdallah Osman
49-30-337 87 85
**Hamburg–** A.Hekim Gülsün
49-40-40 33 88
**Bonn–** Ahmet Baraçkılıç
49-228-66 62 49
**Amsterdam–** Cotyar Zaxoy
31-20-613 07 66
**Swed–** Amed Tigris
46-8-740 69 81
**Hannover–** Selîm Biçûk
49-5721-813 60
**Munchen–** Mahmut Gergerli
49-871-670 884
**Atina–** Sîrwan Reşîd
Bekir Bahoz
30-1-3634905


www.arsivakurdi.org

# HILBE AGIRÎ






**Serhildana Çiyayê Agirî rûpeleke bi rûmet e, di dîroka Kurd û Kurdistanê de. Di têkoşîna rizgariya neteweya Kurd de, ew xwedî cihekî girîng e. Lîder û serleşkerê vê serhildanê Îhsan Nûrî Paşa bi têkoşîna xwe ya xurt hê jî bîrewer e û giyana welatparêzan geş dike. Hem di wextê şerê Çiyayê Agirî de, hem jî piştî serhildanê bi jiyana xwe û xebatên xwe yên bêrawestan tu car dev ji baweriya xwe ya ji bo Kurdistaneke azad û serbixwe berneda.**

## SEROKÊ SERHILDANA ÇIYAYÊ AGIRÎ

# ÎHSAN NÛRÎ PAŞA

Îhsan Nûrî Paşa di sala 1893'an de li bajarê Bilîsê ji dayika xwe bûye. Piştî kutakirina dibistana ewil, li Erzinganê dibistana ruştiye ya eskerî, li Stenbolê jî Dibistana Şer xwendiye. Dû re di nav artêşa Osmanî de wek serbaz wezîfe girtiye û di gelek şeran de jî li eniyê cih stendiye. Piştî rawestîna Şerê Cihanî yê Yekemîn têkilî bi Cemiyeta Tealî ya Kurdistanê re datîne. Di nav hin komiteyên wê de cih distîne.

Îhsan Nûrî di şerê li hemberî Ermeniyan de birîndar dikeve. Di vê demê de bi serbazên ku ji bo azadkirina Kurdistanê ji leşkeriya Osmaniyan reviyan re dikeve têkiliyan û ji bo sazkirina teşkilatekê dest bi xebatê dike. Dema Osamanî bi vê yekê dihesin vî derdixin Dîwanî Harbê, lê di dest wan de tu delîl nîn in.

Îhsan Nûrî Paşa, dema gelşa Musulê ji nû ve derdikeve meydanê. Derbasî Diyarbekirê dibe û tê ser yekaneyên li Bişêriyê. Di vê demê de bi serbaz û pêşekên Kurdan re dikeve têkiliyê û li Elkê (Beytuşebab) serhildana ewil li dar dixin, lê têk diçin. Elî Riza Beg tê girtin, Xurşît Begê Hertoşî jî direve Zaxoyê. Îhsan Nûrî Paşa jî tevî hinek hevalên xwe derbasî Başûrêbiçûk dibe. Ji wir jî diçin rojhilatê Kurdistanê, li wir bi têkçûna serhildana Şêx Seîd dihesin. Li ser vê yekê pêşî berê xwe didin Şemdînan, lê pişt re derbasî Îranê dibin û li wir Îhsan Nûrî tê girtin. Di sala 1927'an de tevî 20 şervanan, bi talîmata Xoybûnê li Agiriyê serî hildidin, piştî demekê ev serhildan têk diçe. Li dû vê têkçûnê Îhsan Nûrî Paşa diçe Îranê.

Îhsan Nûrî Paşa di 18'ê Adara 1976'an de li Tehranê li ber deriyê xwe dikeve bin motosîkleteke û birîndar dibe. Di 25'ê Adarê de dikeve nav refên şehîdên Kurdistanê.